Ronahîyin li ser Rewşa çand û rojnamegerî ya kurdî li rojavayî kurdistanê

LAWKÊ HACÎ

Di destpêkê de da ku em karibin rewşa çand û rojnamegerî ya kurdî li rojavayî kurdistanê binerxînin di rojên îro de tê xwestin em hinekî bi şûnde vegerin li dîrokê û hinek nimûneyan bînin ziman, wek ku em bi gişti têde dighên çawa ku pêywendiyên xurt û girêdan di navbera konevaniyê (Siyasetê) û aborîyê de heye, wisa pêywendî di navbera çand û konevaniyê de heye.

Ji me tevan re diyare ku rojnama (kurdistan) ewa yekemîn bû ku hate çapkirin di jiyana kurdan de di 22 nîsanê de sala 1898z li Qahîra paytexta mesir ji alyê

rewşenbîrê Kurd (Mîr Muqdad Bedirxan) û ev çalakî ya han ewe zayîna guhdana i ziman û çand û kultûr a kurdî û di gel mebesta wê ya konevanî ji ber seydayê çapemenî ya kurdî (mîr Muqdad) di wê bawerîyê de bû di wê serdanê de ku karekî wisan wê bibe sedemên afirandin, şoreş û serhildanan dijî dagîrkerên kurd û kurdistanê wek ku îro tê zanîn hebûn yan jî heyîna miletan li jiyanê ziman û çanda wane, kultûr û dîroka wane

Eger ev peyda nebe di nav netewekê de wê ew netew li jiyanê nabe.

Û eger merov lê xwedî derneket roj bi roj merov ber bi wendabûnê de here. Rojnama kurdistan ji bilî rola xweyî çandî, Roleke xweyî giring lîst di warê gel peristî, lê li nav civata kurdên rojavayî kurdistan û bi taybet li (Dîmeşq) peytexta Sûrya yê ji ber belav kirina rojnama (Kurdistan) ji wir belav dibû hemû perçe yên dî yê kurdistanê.

Nimûnek wek:

(Mirovekî kurd ji taxa kurdan ji Dîmeşq namek şand ji mîr Muqdad re û nama wî belav bû di hejmara (3) de ku ew gelekî serfiraz û dilxweşin bi rojnama (Kurdistan û gelek dost û hevalên wî yên kurd bi dilgeşî dixwînin û li ser giringî ya rojnamê axaftin kir) ev bi xwe amajeke ku rojnama kurdistan roleke xweyî giring lîst di nav kurdên rojavayî kurdistan.

Kar û çalakî yên di ber çand û rojnamegerî ya kurdî de hate kirin li rojavayî kurdistan di sala 1932 dema mîr Celadet Alî Bedirxan dest bi çapa kovara Hewar û Ronahî kir û di berre Elfeba Kurdî çêkir û çapkir, kovara Hewar di 15 nîsanê sala 1932 destpêkir û hejmara wê ya dawî di sala 1943 hejmara rojnama Hewar bi tevahî gihişte (47) hejmaran û bi tîpên latînî bû.

Kovara Ronahî kovareke heftane bû, kovareke wêjeyî û rewşenbîrî bû, ew jî li dîmeşqê çap dibû bi tîpên latînî.

Ji bilî herdû kovaran, mîr Celadet pirtûkxaneyeke kurdî çêkir bi navê pirtûkxana Hewar û hejmara lê hate çapkirin ji pirtûkan gihişte (20) pirtûkan û ev pirtûk li ser mijarên rewşenbîrî ya kurdî û rêzman û ferheng û pirtûkên olî û çîrok vediwestîn, evê rêveçûnê sûdeyek (mifa) mezin gîhande çand û rojnamegerî ya kurdî li rojavayê kurdistanê.

Hindek ji van sûdeyan

1_Hişayr bûna hestê netewî û gelperistî û çesbandina wê li rojavaî kurdistan.

2_Avêtina gava yekem di warê çapemenî ya kurdîde û naskirina wê cara yekem.

3_ Zayîna elfeba kudrî bi tîpên latînî

4_ Çêkirina pirtûkxaneke kurdî cara yekem bi navê (Hewar)

5_ Diyar kirina çendek ji rewşenbîrên

kurd hîmên pêşîn li rojavayî kurdistanê mîna Nûrddîn Zaza û Osman Sebrî û CegerXwîn û Reşîdê Kurd û Qedrî Can ji navbera vê rêveçûnê de û rola wê ya giring di nav civata kurdî de tiştên din yên hêja hatin holê.

wekû:

1_ damezirandina komela Alîkarî ya kurdên belengaz li bajarê (Hesekê) sala 1932z serokê komîtê Hesen Haco Axa ev komel bi alîkarîya komîta (xwîbûn) hate damezirandin.

2_ **Komela hêvî** li (Dîmeşq) di sala 1937 hate damezirandin bi destê Nûriddin Zaza û ji mebestên wê yên herî giring hişyar kirina xortên kurdan li rojavayî kurdistan û wan lê haybikin li pêwîstî ya heyîna rêxistineke siyasî ji bo çareserkirina giriftara kurdî li rojavayî kurdistan.

3_ **Yane ciwanên kurd** li (Amûdê) hate damezirandin di sala 1938z û seydayê Cegerxwîn roleke xweyî giring û erênî û list di damezirandina vê yanê de û ev nadî hate şûnaskirin ku ew û navendeke ji bû Hozanê û rewşenbîryê û werziş yê.

4_ **Yana kurdistan** hate damezirandin di sala 1938 li taxa kurdan (rukneddin) li dîmeşq paytexta sûryê. Ev nadî ji encama hestên gelperistî hate damezrandin û ji endamên wê mîna Celadet Bedirxan û Osman Sebrî û Nûriddîn Zaza û Ji kar û çalakî yên vê nadyê, Danîna menahicên rewşenbîrîyê û perwerdeyê bi zimanê kurdî pîtên latînî.

5_ **Komela zanistî û alîkarîya** bi kurda re hate damezrandin di sala 1956 li bajarê (Heleb) li ser destê Dr. Nûrî Dêrsimî bi tevlêbûna Rewşen Bedirxan û Hesen Hişyar û çend rewşenbîrên din ji kurdan.

Piştî van çalakîyan bizava di vê rêveçûnêde di ber çand û kultûr û rojnamegerî ya kurdî de ji encama wê. Zayîna rêxistineke siyasî de sala 1957 li rojavayî kurdistanê hate damezrandin bi navê (P.D.K) û ji kar û çalakî yên vê partîyê ku rojnameyek siyasî bi navê (dengê kurd) bi tîpên latînî çapkirî ji sala 1957_ 1965 hejmarê vê rojnamê gihişte (9) hejmaran lê di sala 1965 ev rojname bi xwe hate çapkirin bi zmanê Erebî di bin navê xwe yî berê de (dengê kurd).

Lê di vê serdemê de rêveçûna rojnamevanî ya kurdî raserî gelek asîteng û zehmetîyan dihat ji ber ew derbazî bizavek nû dibû û gelek kêmasîyên wê hebû çi di warê rewşenbîrî de û çi di têgihiştinên siyasî de.

kêmasî û asîteng wek:

1_ Perçebûna partî (Ew bû sedemê perçebûna rojnamegerî yê).

2_ zixtên ji hêla dewleta sûryayê li ser çalakîyên partî û çand û rojnamegerî ya kurdî.

3_ mij û morana li ser gotarên siyasî yê kurdî

bi taybet di navpêş kêşên partî de.

bi vî awayî rojnamegerî ya kurdî û wêje ya wê kete jîngeheke dî û pêngavên nû hatin avêtin.

1_ pirbûn û rengînî ya rojnameyan û kovaran û pirtokan û mijarê wan ku li ser vediwestîn bêhtirîn di warê rewşenbîrî û wêje û dîrok û filoklorê kurdî bû.

2_ heyîna jimareke mezin ji rewşenbîran ku xwe dane hawirdor refara xwe.

3_ guhdanek li ser pêwîstî ya hînbûna zimanê kurdî û çesbandinê wê dinav nifşên xortan de.

kovarên bi zimanê kurdî hatine çapkirin ji sala 1968_2002.

1_ **Kovara Gulîstan** di sala 1968, sernivîserê wê Cegerxwîn bû ev kovara yekemîn bû ku piştî Hewa û Ronahî bi zimanê kurdî hate çap kirin û berdewame ta roja îro. Tevî ku carna jê vediwestî.

2_ **kovara gelawêj** 1979_ 1996 kovareke rewşenbîrî bû hejmarê wê gihişte (28) hejmaran.

3_ **kovara sitêr** 1986_ 1994 kovareke wêjeyî û rewşenbîrî bû (24)hejmar jê hat çapkirin.

4_ **kovara xunav** 1986_ 1995 hejmarê wê gihişte (18) hejmaran naveroka wê li ser (ziman_ rêziman_ tore_ filoklor û babetên welat perwerî û niştimanî).

5_ **kovara Gurizik gul** 1989_ 1992 hejmarên wê gihiştin 15 hejmaran.

6_ **kovara zanîn** 1991_ 1998 hejmarê wê gihiştin 11 hejmara

7_ **kovara Gulîzar** 2000_ 2003 hejmarên wê gihiştin (9) hejmaran, kovareke demsalî bû bi taybet bo zarokan bû. xwedî û berpirsyar (Lawkê Hacî).

Rojname

1_ **Newroz** 22_ nîsanê sala 1995 berdewame, siyasî û rewşenbîrpî ye.

2_ **Deng** 1995 sîyasî ye bi taybet li ser rewşa kurdên rojavayî kurdistan.

her wekû em têde dighên û ji mêjde zanyarên siyasî û wêjeyî anîne ziman ku pêşketina rewşa çand û wêje yê girêdayî ye bi rewşa pêşketina siyasî ya wî miletî ve, rewşa çand û rojnamegerî ya kurdî li rojavayî kurdistanê di vê serdema me de di rewşeke pir xirab û zehmet de ye ji ber ku partîyên me yên kurd li rojavayî kurdistanê ne di wî warê ku karibin berpirsîya giriftyara gelê kurd li perçê kurdistanê bikin ji ber ew bi karê xwe yê siyasî daketine û hay ji hîmê bengehîn yê heyîna miletê xwe nîne ku heyîn di ziman û çand û kultûrê deye û tu destên alîkarîye pêşkêş nakin ji rewşenbîr û nivîserên serbixweve û di gelek warande jî dibin asîteng ji wan re.